
# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (228):

## Gundê "Hecqasma", kuştina parêzerekî di hepseke Istîxbaratên Turkiyê de, girtinine bêsûcane, qutkirina darên zeytûnê, vêrgiyên "Ebû Emşe" yên nû














Piştî rojekê ji girtina zorane û veşartî di hepseke Istîxbaratên Turkiyê de li Efrînê û bi sedemeke siyasî, parêzerekî Kurd li nîvê şevê jiyana xwe ji dest dide, li roja din termê wî radestî xwediyan dibe, û li ser govdeyê wî şopên îşkencekirinê aşkere têne diyarkirin; Lê destikên Destlatên dagîrkeriyê bi çixîzeke pênûsê tewanê vedişêrin (dibêjin sedema mirinê kirîzeke dilî ye), wekî ku vêgunehber di seyraneke geştiyarane û ûtêleke pêncstêrkî de bû, û bê ku eniya yekî ji şêx û meşayixên "Şoreşê", Yekîtiya Islamî ya Sûrî - Istanbûl û Kiwalisyûna Sûrî - Ixwanî û yên din xuh bide.

**Ev jî binpêkirin ú tewanin têvel in:**

**= G. "Hecqasma":**

Bi Navça Mabeta ve girêdayî ye, /16/KM ji navenda wê dûr e, ji dora /70/ malî pêkhatî ye, dora /350/ nişte ji nişteciyên Kurd ên resen têde bûn, dema dijberiya bi ser herêmê de tev penaber bûn, jê dora /15 malbat = 40 nişte/ vegerîn, yên din zorane hatin koçberkirin, û dora /5 malbat = 30 nişte/ ji anîndeyan têde hatin niştecîkirin.

Di dema şer de carekê gund hate bombebarankirin, û di encamê de Mala "Umer Hesen Ebû Fexrî" -ya ku berê avahiya dibistanê bû- bi piçekî hate roxandin.

Milîseyên " Lîwa'i Mihemed El'fateh" -yên ku Mala "Mecîd Ehmed Mecîd" ji xwe re kiriye biryargeheke leşkerî- gund desteser dikin, lê belê Milîseyên "Lîwa'i Semerqend" jî Mala "Fayêq Hisên Ezîz" li çateriya gund kiriye biryargeheke leşkerî; Û piştî ketina gund, milîseyan xwarinvexwarin, cerên gazê, alav û amûrên elektirîkê û hin tiştên din ji malan dizîn, û herweha jî tevahiya kelûpelên hundir /6/ malan, giropa zayenda elektirîkê ya gund, pîkabeke Datson e "Heyder Heydo" û guheztok û keblên toreya elektirîkê ya giştî.

Û "El'semerqend" dest daniye ser (/400/darî zeytûnê yên malbata"Oso", /200/darî zeytûnê+/40/ darî gûzê yên "Elî Bekir", /150/ darî zeytûnê yên "Umer Bekir", /400/ darî zeytûnê yên "Hemê Elûş"), û ew û "El'fatêh" -her yek di çarçewa xwe de- 50% vêrgî li ser werzên hemwelatiyên ku ne li gund û 10% jî li ser berhema werzên ên li gund ferz dikin, bi ser de jî vêrgiyên têvel û neçarkirina hemwelatiyan ku werza zeytûnên xwe li guvêşgeha Gundê "Rûta" yê hevcîwar -ya ku "El'semerqend" dest daniye ser- biguvêşin, û di vî warî de dema ku "Luqman Hesen" berhema xwe ya zeytûna sala borî li derveyî gund guvaştiye, "El'semerqend" /50/ teneke zêt (her yek/16/KG sade) bi zorê jê stand; Ji bilî wêjî dizînên ku dighêjin werzan(mûsiman), û çêrandina bêwijdan ji keriyên pêz re di nav zeviyên zeytûna û erdên çandiniyê de, bê ku yek ji xwediyan wêribe li hemberê bisekine yan jî gilî bike.

Û xelkê ku li gund mane jî rastî pinpêkirinên têvel tên, mîna girtin, îşkencekirin, rûmetdaxistin, persitandin û koçberkirina zorane û hinên din, û herweha jî bikaranîna çar tirektorên çandiniyê û xwediyên wan bi zorê û bê pere di xizmet milîseyan de.

Û milîseyan ji bo êzingkirin û bazirganiyê piraniya daristanên sinoberê yên xwezayî li dor gund - cîgehên (Çiyayê Te'itika - Rojavayê gund, Çiyayê Ke'inîka - Başûrê gund, Geliyê Kaniyê - Başûr Rojhilatê gund) qut kirin, û weha jî çar darên zeytûnê yên /50/ salî yên "Elî Bekir" ji kokê ve.

Û di çarçewa tevgereke olî ye tundrew û çalak de li herêmê, Mala "Elî Bekir" bû mizgeft.

Û di encama fişaran de, Hemwelatî "Mistefa Menan Yûsêf" neçar bû ku tevî malbata xwe penaberî Gundê "Hisê/Mîrka" yê hevcîwar bibe, ewê ku li 1.7.2020an. Z kurê wî "Mihemed/18/sal", li nêzîk mala wî, bi dara gûzê ve darvekirî û daliqandî hatiye dîtin.

**= Kuştina di bin îşkencekirinê de:**

Li siba Pêncşemê 22.12.2022an. Z, Destlatên Dagîrkeriyê merivên Parêzer "Luqman Henan kurê Hemîd" - zayîna G. "Hecqasma" - N.Mabeta 1977an. Z û bavê sê zaroyan agahdar kirin, ku termê wî ji Nexweşxana "Efrînê ya Leşkerî - ya berê Şehîd Ferzende" dihate nasîn radest bibin, û di heman rojê de piştî nîvro, di Goristana "El'zêdiyê" de - Taxa Mehmûdiyê Bajarê Efrînê, li kêlek gora diya xwe hate veşartin.

Vêguneh "Henan" li malê li Taxa Mehmûdiyê, li êvara Sêşemê 20.12.2022an. Z, ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Rêzanî" -ya ku avahiya "Siyasiyê" ya berê li orta Efrînê ji xwe re kiriye biryargeh û ewa ku bi behaneya lêkolînkirinê, bi bendkirinên dirêj û işkencekirinên tund ên pireng ji girtiyan re tê naskirin- hate girtin, xilyewî û laptopa wî jî jê hate birin, bi tuhmeta têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re û

piştgiriya wê, piştî fisûkiya çekdarin Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" li dijiyê, ji ber ku wî -li gor kanînê- alîkariya xelkê dikir da ku daxwaza mafên xwe bikin, û li dijî binpêkirinan disekinî, û ji bîr nebe ku nexwaşiyên mofirk û hestiyan jî vê re hebûn.

Li gor wêneyên ku derketine, bi zelalî diyar dibe ku dilovanber rastî îşkencekirinê hatiye, bi taybetî şikestina tiliyên pêyên wî û pêvedana elektirîkê; Û rapora dozgerê dadmendiya Efrînê yê nobedar û bijîşkê rewayetî -yê ku şopên îşkencekirinê red dike- nîşan kir ku ew berî dîtyariyê (deh û nîv sibehê) bi deh katan miriye, yanê li nîvê şevê.

Bi bîr were jî ku ew berê jî carekê li 26.7.2022an. Z ji aliyê Asayêşa Sivîl ve hatibû girtin, û bêtirî carekê jî ji aliyê milîseyan ve hatibû bendkirin û pere jê hatibûn sitandin.

**= Girtinine bêsûcane:**

**-** Ji dora çar heyvan ve, piştî ku Hemwelatî "Ziyad Isma'îl kurê Seydo/40/sal" ji Libnanê vegerî gundê xwe "Tirmûşa" - Navça Şiyê, bi tuhmeta têkeliyê bi R.X a berê re, ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên Asayêşê ve hate girtin, û "Dadgeha Efrînê" bi du salan hepis ceza kir.

**-** Li 27.11.2022an. Z, rêbendeke Milîseyên "Asayêşa Leşkerî" li ser riya Reco - Efrîn, bi tuhmeta têkeliyê bi R.X a berê re, endezyar "Remzî/Remedan Hec Reşîd kurê Mihemed/42/sal" girt, û ta niha bêsûcane bendkirî ye.

**-** Li êvara 21.12.2022an. Z, Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên Asayêşê li Reco, bi behaneya li darxistina sersaxiyekê di Mala "Elî Ereb Hesen" de, ji bo pakrewanbûna keça wî ya şervan di nav refên hêzên Kurdî de û ya ji jina yekê (ya ku li Herêma Şehba'i dijî - Bakurê Heleb), hemwelatî "Elî Ereb Hesen /57/ sal û kurê wî yê negihayî Mistefa, Şêxmûs Hisên Dodîk /23/ sal, Umer Hemîd Xalêd /60/ sal, Fewzî Mihemed Gulo /50/ sal û jina wî Emîne û du keçên wî yên negîhayî" ji xelkê Bajaroka "Meydanekbezê" û mîvanê yê dawîn "Selah Erebo /52/ sal" ji Gundê "Kurê - Şediya" girtin, bi ser ku "Ereb" keyayê bajarokê ye jî.

**-** Li êvara Înê 23.12.2022an. Z, bi tuhmeta têkeliyê bi R.X a berê re, Milîseyên "Asayêşa Bilbilê" herdu bira "Xelîl /55/ sal û Şe'iban /40/ sal kurên Mihemed Eteş" ji xelkê Gundê "Şingêlê" û mîvanê wan "Ehmed Isma'îl Sîno/28/sal" ji xelkê Bajaroka "Meydanekbezê" girtin, û ta niha bêsûcane bendkirî ne.

**= Binpêkirinine din:**

**-** Li vê dawiyê, Milîseyên "Lîwa'i El'semerqend" ên Bajaroka "Kefirsefrê" - Navça Cindirêsê desteser dikin, ji bo êzingkirin û bazirganiyê, dora (/120/ darên zeytûnê yên "Reşîd Hecî Heso", /80/ dar ên "Ehmed Reşîd Mehmûd", /9/ dar ên "Ebid El'henan Hec Ebdo") bêwijdan qut kirin.

**-** Di navboriya hefteya borî de, Milîseyên "Lîwa'i Siqor El'şemal" kokên dora/200/darên zeytûnê yên Hemwelatî "Reşîd Ehmed Henan, Henan Osman Kolê" ji xelkê Gundê "Bêlê" - Navça Bilbilê hilkirin, piştî qutkirina pircar û bêwijdan di salên borî de.

**-** Mihemed El'casêm (Ebû Emşe) serkêşê Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah" ên ku ji dêvla "El'cebhe El'şamiyê" Bajaroka Mabeta destser dikin, ji nû ve /250/ teneke zêt (her yek /16/KG sade) weke vêrgî li ser malabatên Kurd ferz dike.

Tewanin bê lêkolînên zelal û neyalane û bê şopandina tewankaran têne kirin; Gelek kiryarên bevajiyane ji Zagona Navdewletî ya Mirovane re têne kirin, û bi ser ku Turkiyê li gor hemî pîvanan Efrînê dagîr dike, Civaka Navdewletî jî li hember wan kiriyaran bêdeng e û Hikometa Anqerê di ber de berpirsiyar nabîne; Û Komîta Lêkolîna Navdewletî ya Serbixwe û taybet bi Sûriyê binpêkirin û tewanên ku li herêmê dibin bi têrm û têgehên nermik dinirxîne.

25.12.2022 an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

-------------------------

**Wêne:**

- Roxandineke piçekî ji Mala "Umer Hesen Ebû Fexrî" re - G."Hecqasma".

- Ciwanê mirî "Mihemed Mistefa Yûsêf".
- Pakrewanê Parêzer "Luqman Henan kurê Hemîd".
- Şopên îşkenecekirinê li ser givdê vêgunehber "Luqman Henan".
- Rapora dozgerê dadmendiya Efrînê yê nobedar û bijîşkê rewayetî.